

azadî

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ



*ji azadî û serxwebûnê birûmettir
tistek nîn e. (Ho Chi Minh)*

hejmar 3

cotmeh 1978

KURDÎSTANA

PİRSA YEKÎTÎYA

Ji her du hêzên ku doza serokîtiya tevgera rizgariya Kurdîstana Iraqê dikin, PDK, di destê serokîtiyêke paşverû, le-yistoka Îran û CIA yê, indî bûye asêyî li ser riya pêşveçûna hêzên şoreşgerên Kurd. Serokên wê hin li Londonê hin li Washingtonê, hin li Tehranê bi mîlyon dolarên ku di dema "Şoreşê" de dabûn alî, bi yên ku hêjî ji Îran, Amerîka, Îsrafil, hwd, ji wan re tînin ji xwe re wek paşan, wek şêxên xwediyên bîrên petrolê dijîn; ticareta belengazî û bindestiya gelê Kurd dikin. Ev serokatiya xiryayî, kevnare firo indî hêlîna axayên şer bazirgan, diz û keysperesta ye: Li dora wê, kesên bêbawerî, bê bingeh, loqo, qulipok, şorbeger diçin û tînin. Me di hejmara xwe ya borî de nîşan da çima bi serokatiyêke awaha şerê gelê kurdê Iraqê tucar nikare biserkeve û çima riya rizgariyê di paqijkirina van bermayeyên sedsalên XVIII-XIX an de derbas dibe.

Hêçî liser hêza din, Yekîtiy Nîstîmanî Kurdîstan (YNK) hin kes hê hin xewn û hêvîyan xwedî dikin, daxwazên dilên xwe dikin şûna pêkahiye, xwe bi rewnaya (xeyala) YNK a paşverû dilorînî, YNK di valahiya siyasiya ku piştî adara 1975 an bi reva serokatiya PDK a Iraqê li Kurdîstana Iraqê peyda bûbû, saz bû û xwest ve valahiya dagire; ji pêşmergeyên bêserî, bêserokîtiya siyasi mayî re serokîti bike, serê li hemberê re

jima faşizma Iraqê bajo. Awê ku himdarên wê dibêjin ew "ne Partî ye, ne jî Cephe ye". Ango ne hevde saziyêke li ser bingehên ideolojîk saz bûyî û ideolojîyêkî bihev girêdayî ye û ne jî Cepheyekî ku partiyên wilo lidora bernameyekî hevrayî û asgarî dighîne hev. Em dikarin bêjin ku YNK ne tenê ne Partî û ne jî Enî (cephe) ye lê ne yekîti ye jî. Kombûnek e ku kes û komikên ku jiber sedemên cihê lidervayî an li dijî PDK a Barzanî bûn, an heta rojên dawî-

nên adara 1975 an jî di PDK da bûn û xwe jê dîrkin, dicivîne hev. Tê de sê cihê he ne, li gora xurtahiya xwe:

Me di hejmara II an de, di benda liser Kurdîstana Iraqê navê kôvara Tirk Briefing hîl dabû lê hejmarên wê hatibûn jibîr kirin. Vane ev hejmar: Briefing, Weekly Indepent Magazine, Ankara
June 21. 1978
July 12. 1978

SERRECEM

- Barzanî û Îran.....r. 7
- Ji Gernama Ewliya Çelebî.....r. 8
- Ji Dîroka Kurdîstanê.....r. 10
- Daxuyaniya Partiya Komunîst.....r. 12
- Bingehên destpêkiyên Felsefê.....r. 14
- Rizgariya Jinañ:.....r. 15
- Xebata Yekîtiya Xwendekarên Kurdîstanê li Fransa.....r. 16
- Pirs AKSA.....r. 18
- Mirina Ereba Şemo.....r. 20
- Zman.....r. 23
- Stran û Leylan.....r. 24

Li ser şerê hindurê

IRAQÊ (II)

NIŞTIMANÎ

1° "Pêşverûyên biserêxwe" ku Celal Talabani û hevalên wî yê nêzîktir in 2° Tevergera sosyalîsta Kurdistanê 3° Komika Marksîst-Lenînîst an Ev komikên cihê reng û pirtexlît liser çî hîm û esasê dîghên hev? Dîjîtiya "serokatîya eşairî" ya Barzanî û xîstina hikûmeta Bexdayê.

Her çiqas dijî hin tîstan bûn dikaribe komikan û kesan liser pirsên taktîk nêzîkî hev bike ev jibo sazûna serokatîyeke ahengdar, hevgîr, xurt têr nake. Divê ku li ser tîstên ku dixwazin çê bikin, li ser awayên xebatê û ajotîna ser, liser hevalbendiyên hindur û derve jî lihevhatinekî hebe, û hin bîngêh (prensîb) giyanekî şerkarî bidin vê avahîyê rêya pêşîya wê ronak bikin.

Jî van tîstên ferz yek jî di YNK de tune ye û heta niha Talabani û hevalên wî ku devê kîsikê pera digirin YNK ê li gora qîma xwe dajon, her dî komikên din tenê wekî xemlekî ne, bikêrî propoganda wan tî. Hin heval bawerdîkin ku hîmin di YNK a de hin kesên şoresger "sosyalîst", "marksîst-lenînîst", dilsoz, fedekar he ne û dixwazin bi dil û can jibo rizgariya gelê Kurd tîsteki bikin, divê em li YNK ê bi çavê hêzekî welatparêz, tewer şoresger binêrin.

Lê di vê pirsê de yê ku xwezaya hêzekî kifş dike ne axaftin, belavok û tîstên nûsî an gotî ne lê pratîk e, tetbîqat, tîstên kirî ne. Û berî hemîyan kirinê serokatîya wê hêzê ne ku ev serokatî di aliyekî de doza şoresgerî û şerê dijî emperyalîzmê bike û di milêdin de piştî xwe bi paşverûti-

ya Sûriyê ve girêde, ku bi Urdûna Melik Huseyin û bi Iranê re rabe rûnê meriv divê hikmê xwe li gora van kirinan bide ne li gora gotinan.

Xwezaya serokatîya YNK

Em cardin bikin ku di tevgerekî de pîrsa hîmî û sereke ya serokatîyê ye, daxwaza dilê filankes an bêvankes nîn e. Erebeke çiqas qenc dibe bila bibe, heke yê ku wê dajo riya pêşîya xwe nebîne, kilekor an bêberpîrsiyar û serxwes be, ew erebe nikare rêwiyên xwe bîghîne merem û armanca wan. Serokatîya tevgerekî weka yê ku erebê dajo ye, heta ew ne têkûz serwest, ewle û bi îtbarî be, hêviya pêşveçûnê tewş e.

Çi ye xwezaya serokatîya YNK? Polîtburoya wê de pênc kes hene. Di destpêkê de du jî wan nêzîkî Talabani bûn û du kesên din (yekî sosyalîst û yekî "marksîst-lenînîst") bi sedîsed ne bi Talabani re bûn. Jiber awayên xebatê û danûstaniyên paşverû û nedemokratîkên Talabani, kesê sosyalîst (Resûl) jî Polîtburoyê firekîsiya û peyayê "marksîst-lenînîst" jî di serekî li dijî Iraqê de mir. Niha Talabani ne tenê serekê YNK ê lê serwerê tewnayê (mutlaqê) vê hêzê ye; her tîst di destê wî de ye. Çawa Barzanî Şahê PDK û Kurdistanê bû, Talabani jî dîktatorê tewnayê YNK ê ye. Di vê hevdesaziyê de jî demokrasî yê, jî idara hevrayî (mîsterek) tu eser tune ye. Talûka jiyaniya vê sistemê di adara 1975 an de gava Barzanî fermana sekinandina ser da hate ditin.

bê partîyeke şoresger

şores nabe!

YNK: awayên- PDK eynî dide domkirin. Di hindurda serweriya kesekî, tunebûna demokrasîyê û ji hemîyan girîngtir, tunebûna gihîstina siyasiya pêşmergan. Seroketiyeke ku doza rizgariya gelekî dike ne kovareke teorîk derdixe ne xwendegehekî şoresgerî vedike jibo peyîvdariya pîrsên şoresê û gihîstina siyasiya pêşmergan. Ev jî tinebûna birewerên gihîstî ye an serokîti gihîstin û çavvebûna pêşmergan jî bo xwe talûke dizane? Pêşmergeyên YNK jî wek yê Barzanî bi emrê fermanan radibin, bi kesan bawerî anîn e; îdeolojiyeke şoresgere ku wan bi hev ve girêde, ku çarenûsa (qedera) ser ji destên daxwaza kesan derxe, têxe destên komê, destên hevdeşazî yê tune. Bi kurtî partiyeke şoresger tu ne ye. Lê ceribandînen xelkên din u yên me jî bi deh caran nîşan dane, abê partiyeke şoresger şo

res çênabe! Lewra, bi vê mese YNK jî ewê tenê dikaribe ser bike, lê nikare şores bike û zû an dereng ewê jî bikeve rewşa PDK yê; piştî çend salê ser ya bi birrîna arîkariya Sûriyê bire ve an jî bi hikûmeta Iraqê re lihev were; Çend serokên wî bin xwedî cî û meqam; kurdên din jî di halê xwe de bimin. Ji xwe berî çend mehan, hindik mabû ev yek biqewimiya: piştî çûna Sadatî Qudsê, Elî Eskerî, li ser navê YNK ê çû Baxdayê û berpirsiyarên Baasî re ket peyîvdariyê; "Sadat, Ereba kir rewşekî xerab. Divê em li hember Israîlê rêzên xwe xurtkin, serê nav xwe rawestînin. Werin Kurdên şareder û sirgûn kirî vegerînin ciyên wan, lihevhatina 11 Adar 1970 an bicîh bînin û îdara xweser (otonomî) ji Haşim Akrawî wan bistînin bispêrin me em li hev bîn; ser rawestînin."

Lê karbidestên Iraqê guh nedan pêşneyarên (teklîfên) Elî Eskerî û Elî Eskerî ji Baxdayê destva la vegehiya.

SÛRIYE ÇIMA ARİKARIYA YNK Ê DIKE?

Lê qelsahiya girantir a YNK ê ewe ku ew dixwaze bi ava kî sandî aş bigerîne; bi arîkariya Sûriyê Kurdîstana Iraqê rizgar bike. Mako Sûriye dewle teke paşverû ye, Kurdê nava xwe diperçiqîne, diêşîne, ji gundên wan derdixe, tu mafan nade wan. Sûriye piştî tevgera filîstînî şkand. Sûriye bixwe pîrî caran di bin siya Riyadê ye. Niha nava wê û Iraqê de li ser avên Firatê û li ser serokîtiya Baasê hin dijhevî hene, wan divê rojekî li dora masekî rûnên û van pîrsan safîkin, çawa Iraq û Iranê pîrsên nav xwe li Cezayîrê helkirin. Berî lihevhatinê, herkes dixwaze tiştên xwe yê bazarkirinê zêde bike, destê xwe xurtir bike. Lihember Iraqê, Sûriye tenê dikare arîkariya ku dide Kurdên Iraqê bazar bike; bêje Baxdayê heke tu filan û filan tiştî bidî min ezê jî arîkariya ku

didim Kurdên ku serê te dîkin, ew qas gêjahî û xesar didin te bibirim û bêarîkariya min ewê ser bisekine. Minaka (mîsala) Iranê hê li ber çavên me hemîyan e.

Ji vê yekê çî dertê: ku Sûriye arîkariya xwe bibire an Tirkiye tixûbên xwe qenc kontrol bike, YNK weka avahiyeke li ser qûmê avakirî hildiwese, wekî masiya ku av li serê hati-be birîn, hişk dibe.

Li ser hîmên ev çend sist û li hewa, bi qedera xelkekî re leyistin bi hindikî maceraperestî ye.

Heta niha me tiştêkî li ser averû (zihniyet) û îdeolojiya serokên YNK ne got. Lê hate nîşandan ku îdeolojiya wan çî dibe bila bibe, şertên objektîfên liyor jimartî wisa nin ku serê wan nikare here serî; ew bêberpirsiyarî bi qedera gelekî dileyizin û Sûriye jî jibo

parastina kêrditiniyên xwe bi wan dileyize. Ev rastiyeke eskere ye weke 2 car 2 dîkin 4. Çêtirîn dawîne (netîceya) ku YNK bistîne ev e ku Talabani û Elî Eskerî bibin wezîr lê Kurd di rewşa xwe de bîmînin.

TALABANI KÎ YE?

Gelo Talabani bi vê yekê nizane? Divê meriv bi gotinan bawerî neyne û li pratîka kesekî ku doza soresgeriyê dike binêre. Çi ye ev pratîk? Jiyana siyasetî ya Talabani di 1959 an de destpêdike. Hingê ew û xwezûrê wî Ibrahîm Ehmed bi darê zorê, bi tîfîngan berî serokîtiya PDK a Iraqê, ya ku sekreterê wê Hamza Abdullah bû û bi awakî demokratîk hatibû helbijartin, didin û dikevin şûnê wan, xwe nezîkî Barzani dîkin. Xeletiya xortaniyê? Ihtîrasa karîne? Kîjan dibe bila bibe, awayekî qet ne demokratîk. Di 1962 an de, Cenabî Ibrahîm Ehmed, peywendiyên tevgera Kurdên Iraqê, yê PDK ê û Savaka Şah saz dike! Realpolitik? Zora hewcedariyan? Naxêr, tunebûna bîngehên îdeolojîk, keysperestî. Di 1964 an de Talabani, Ibrahîm Ehmed, hezra hêza xwe nakin, çawa berî Hamza Abdullah û hevalên wî dan, dixwazin xwe ji xanedana Barzani bifilitînin. Sernakevin. Dîrevîna Iranê. Şah çek û pere dide wan. Wan di şîne ser hêzên Barzani. Çend mehên ser. Barzani peywendiyên xwe û Iranê xurt dike. Talabani îndî bi kêrî Şah nayê, Rola wî ew bû ku Barzani mecbûrî hevalbendiya Şah bike. Pîştî ku Şah pê vî karî da kirin berî wî û hevalên wî dide. Ew tîna li Bexdayê bicîh dibin. Di dema ku hikûmeta faşîst gundên Kurdan dişewitîne bi hezaran kes dimîrin, dikeve xîzmeta Bexdayê. Rojname El-Nûr derdixe. Serde ji hêzê xwe çekdar dike, diçe digel leşkerên Iraqî serê hin Kurdên din dike û herwekî bi vesarî û qelsiyên tevgera Kurd dizanibû ji Iraqê bêtir Kurd dide kustin. Ev yek heta sala 1970 domdike. Kêngî Bexdad û Barzani li

hevtên, her du biryar didin ku koma Talabani bê efû kirin. Tis tek ji kîsê Barzani ne diçû. Yê ku hatibûn kustin gundiyên Kurd bûn. Hînan xwe di ber serek esîrên Barzan, yê din xwe di ber sêxê Talabaniyan de didan kustin. Paşê serok, wekî carên din destên hev diguwaştin, li ba hev rûdinîştin.

Çi dibû dîsa bi gundiyên piçûk, peşmergeyên bênav dibû.

Gelo Talabani mecbûr bû biketa xîzmeta Iraqê û serê Kurdên din bikira? Naxêr! Kî kesekî em nebêjin soresger, lê bihindî kî bûrjûwayê demokrat bûna û li dijî awayên dikta torî an paşverûyên Barzani bûya û jiyanê wî li Kurdistanê di talûkê de bûya dikaribû xwe bide alî, li cîkî weke Beyrût, Şam, Qahîre bicîh be! Serê xwe di warê siyasetî û îdeolojîk de li hemberî Barzani bajo. Lê Talabani ne tenê ne demokrat e, ew bi ihtîrasa karîne (îktîdarê) ew qas dişewite ku jibo bicîhanîna vî armançê bîngehîna in ku nikaribe dev jê berneke.

Heke kesekî ev çend bîngeh, qulîpok, maceraperest, rojekî dev ji xeletiyên xwe berde û bixwaze di tevgerê pîşverûde weş endamekî kar bike, divê meriv berî endametiya wî qebûl bike dîrûdirêj bîponije. Lê ev kes îro serekê yek ji hêzên ku doza serokîtiya soresî Kurdan dike û hevalên dora wî, wek Debbabe û hinên din bi keysperestî û bê bîngehiya xwe ji ne kêmtirîn.

Di vî rewşa hazîna da karê soresgerê Kurd ev nîne ku bi hê sabên piçûk û tevlihevên dermanfiroşan bîjin ev ji yê din çêtir e, em aniha pîsta wan bigirin, heye ku çêtir bin, bi edîlin. Gol havên nagire nabe mast! Kesên ku jiyana xwe bi maceraperestî, bazîrganî, qulîpokî, keysperestî derbas kirin bi pîstmîzdan, navtêdan û telqînan nabin serokên soresger! Divê ku ji pîşmergan re, ji karker û cotkarên Kurd re bê gotin, YNK û PDK, bi serokîtiyên xwe yê nihave Keçel Elo, Elo Keçel in. Heta ku ew serokîtiyên neyên guherandin, heta ku eniyê

ki soresgerê rizgariya Kurdistanê neyê saz kirin, heta ku tevgera Kurd ji destên bazirgan, têcîr, dîz û maceraperestên bûrjuwaziyê û ji bin nîrê şêx, axa, beg û serek eşîran nefilîte, gelê Kurd nagihe rizgariya xwe.

serê îdeolojîk li dijî keysperestî û paşverûtîye

Di milê din de hin kes didin pêş ku divê soresgerên Kurdên Tirkîyê an Iranê têkîlî karên tevgera Kurdistana Iraqê nebin. Bi ya wan, ewê gelê kurdê Iraqê bixwe kîjan serokîti jê re çêtir be wê bibijêre, û xurt bike. Ev xêza han gellek pîrsa hîlûike: 1) perçebûnên nav tevgera Kurdê Tirkîyê û Sûriyê di cîkî de bi rewşa Kurd li Iraqê ve girêdayî ne, bi hindikî jê nayên tecrît kirin û qenc tehlîla tevgera Kurdên Iraqê jibo ronakî û safiya îdeolojîka Kurdên din pîrsakî sereke ye, ferz e. 2) Di navbeyna têkiliya fiilî (weka ku Barzanî an Talabanî û dîkin) nav karên Kurdên perçekî Kurdistanê û tehlîla xêza îdeolojîk û hevalbendiyên serokîtiya hêzên wan ên siyasî de cihêbûnek nepiçûk heye. Serê îdeolojîk li dijî keysperestî û paşverûtîyê di nav tevgera Kurdên Iraqê de perçeyyek serê gîstiyê jibo rizgariya neteweyî û civakiya gelê Kurd e. Jê revîn, ji berpirsiyarekî himî revîn e.

3) Him PDK him YNK siyaseta xwe ya paşverû û keysperesta bi dewletên paşverû ve girêdayî li ser navê sosyalîzmê dajon. Divê ku sosyalîstên soresgerên Kurd ji gelê Kurd re eskerekin ku ev sextekarî û keysperestî yên axayên ser û bazirganên kurdîtiyê ne, yên maceraperest û keysperestan e, tu peywendiyekî wan bi sosyalîzmê ve tune ye. Ev kesên han ne bi pratîka xwe ne bi teoriya ne sosyalîst in. û her wekî gotinbêj û peyayên sinifên serdestên Kurd nikarin bibin sosyalîst.. Pêtiya hêviya Kurdistana sosya-

list xwedî kirin bêgoman wezîfeya pêşîna sosyalîstên Kurdistanê ye. Ji vî karî revîn û doza sosyalîstiyê kirin hevûdin nagirin.

4) Hin kesên li Tirkîyê, Iranê an Sûriyê xwe ku sosyalîst nîşan dîdin di eynî wextê de ji pişgiriya PDK an YNK dîkin. Ev ji siyasetekî bêbingeh û bêbasîret e. Bi hindikî sibê ro ku YNK iflas bike ewê ji siyaseta wê bîberpirsiyar dîtin û liberçavên militanên xwe bikevin. 5) Ji tehlîla tevgera kurdên Iraqê revîn ne ji nefspiçûkî ye ne masûm e. Hin kesên ku jiber hin hesabên piçûkên bêşokan (fraksoyanan) naxwazin li vê pîrsê bikolin di milê din de ji Çînê heta Sovyetîstan û Kubayê li ser hemî pîrsên "soresşa cihanî" ahkam û ders didin, li ser pîrsiyarên ku tenê bi nûçeyên rojnama an pirtûkokên ajîtasyon û propaganda bihistine, biryar û hikmên hişk û bêgazî didin. Lê gava ku li bin pozê wan, di nav Kurdan bixwe de hin pîrsên ku dahûrîniya (tehlîla) wan ferz e. serî hiltînin, ji meydana firedikîşin. Divê ku soresgerên Kurd hê ku tîr ji kevan ne filitî ye bi berpirsiyari û mesûliyet pîrsên teorîk û îdeolojîkên tevgera rizgariya Kurdistanê bipeyivin, ronak û eskere bikin. An na piştî ku Barzanî reviya çû Iranê an Talabanî ser hist û çû Bexdayê an Şamê, bi derbekî "bêbextî û kevneperestî" ya wan kîş kirin ne marîfet e, rengê keysperestiyê ye.

Belê divê ku em ji niha ve van rastîyan eskerekin, belav kin, jibo peydabûna hêzên teze, nû, soresger bixebitin, bi gelê xwe bidin fam kirin ku tenê serokîtiyeke ji karker, cotkar û birewerên soresger sazûyî, sosyalîst, soresger dikare ne tenê rizgariya neteweyî lê wisa ji rizgariya civakî bidestxe, ku tu rêyekî din tune. Yên din hemî bibin kortalên bêbînî, belê û mûsîbetên nû.

(w) Binêre rojnama Urdunê Al-Ray; hejmara 25.12.1977 û kovara Lubnant îla al.Aman, ya 6.1.1978.

BARZANÎ Û ÎRAN

Belavkirina agahdarî û nûçeyan jibo nasîna dîrokê û nihayê ferz e. Ev nasîna han jî bi kêrî vekirina rê û bergêhên wêbêyê tên, riya pêşiya şoreşgerên Kurdîstanê ji hin asêyî, xewn û rewnayên pûç paqij dikin. Di vî warî de qenc naskirina tevgera dawîna Kurdên Îraqê, ya xeletiyên wan, naskirina serokên vê tevgerê, zihniyeta wan; nasîna kirin, peyman û havalben diyên wan jibo wêbeyê şerê rizgariya gelê Kurd zehf girîng (mihîm) e.

Di nav sê salên borî de di vî warî de di çapa biyanî de gelêk tişt derketin, pîr tişt eşkere bûn. Hinek ji wan bi destê kovarekên tirkî an erebî gihiştin guhên Kurdan jî. Hinên din, dervayî Kurda cihan hemî dizane. Mako, berî hemiya diviya bû ku Kurd wan binasin.

Me di hejmara xwe ya 2an da li ser "Destbrakiya Barzanî û Israîl" nvisî û keriyek ji rojname cihû "Jerusalem Post" a 16.5.1978 an derxist. Ji Barzanî merem, tenê kesekî ku di demekî de serokîtiya tevgera kurda me zih, giran, tejîhêvî kiriyê û îro, kal, nexweş li Washingtonê dijî nîn e. Barzanî temsîla zihniyetekî dike di tevgera Kurd de, zihniyeteke kevn, kevnare jî sedsala XVIII-XIXa mayî. Ev zihniyeta han

di şertên dinya îroyî de tucar nikare biserkeve û jixwe pêncî sal in, şerên gelê Kurd timî dibêşkênandin û bindestiyê. Barzanî ne kesekî ye; lê bihindikî serokîtiya PDKa Îraqê ya doh û ya îroyê, dîrojên wan in. Ev zihniyeta han çiqas qels ketibe jî hê heye û jibo serfî raziyên wêbêyê divê ku dara rizgariya me ji van şaxên hişkbiyî yên ku bi giraniya xwe pêşiyê li çiqas û kulîlkên teze, jîndar digirin bê paqij kirin, sivik kirin. An na wekî hemî organîzmeyên ku xwe nû nakin, ewê dar hemî li piya hişk bibe û bikeve.

Hê di destpêkê de dibêje; "Karê min îndî qedîyaye. Qet niyeta min tune ye ku cardin serokîtiya şerê Kurdên Îraqê bikim. Ez tenê qûlekî naçarê Xwedê me. Tiştê ku hatiye serê me hemî di qederê me de nvisî bû û ji qederê xelasî tune ye."

Gelo lihevhatina Îran û Îraqê di cihêkî de hinek arîkariya "qederê" nekir û ev lihevhatin ne li dijî Kurdan bû?

Di vê hejmarê de, em keriyekî ji mijûlahiya Barzanî bi rojnamevanê Iranî Amir Taherî derdixin. Ev mijûlahî piştî şkênandina tevgera Kurdên Îraqê, li Iranê derbas bûye û di rojname Iranî ya nûdar Kayhan (hejmara 3.5.1975) de çap bûye.

Amir Taherî wî li qesra wî ya nezikî Tehranê dîtibû û pêre saet û niv mijûl bûbû. Va ne keriyên serekeyên mijûlahiyê.

"Di dengê wî de tu şopa talî an kêfnex weşiyê tunebû. Hey ku li Îranê ye dev ji cîlên xwe yî Kurdî berdaye, saqo: pantor, û qrawat li xwe dike.

“ji qederê xelasî tune ye,”

Bersîva Barzanî ronake; "Berî her tiştî, dibê ku bêjim ku haya me ji vê lihevhatinê tunebû. Lê ez bi vê lihevhatinê re me, jiber ku ew bi kêrî Îranê tê û tiştê ku ji Îranê re qenc e, divê ku hemî Kurd pê re bin." "Iran destê arîkariya da me. Di sala dawîna şerê tu dewletekî qasî Îranê arîkariya me nekir. Heçî yên ku bi derbekî bi hebûna me hisiyên û çend hestîrken durû li ser me rî-

jandin, merema wan te-
nê ew bû ku li dijî
Iranê propoganda bi-
kin (...). Min pêşiya
pêşî zanibû ku Kurd di
şerekî awha adetî de

nikarin serkevin. Me
dikaribû hê dom bikin,
lê ewê xeynî bêtir rê-
tin û kambaxiyên nû bi
kêrî tiştêkî nehata."

Em spasdârên îranê ne,

Dûrê Barzanî hilmekî
ji qelûna xwe kişand
û dest bi peznê Ira-
nê û Şah kir; Em hemî
spasdârên Iranê ne
jibo tiştê ku wê ji
me re bi bawerî û dil
sozî kir. Em niha di
hizûr û qedirgirani-
yê, di bin hîmaya Şa-
henşah, serwerê hemî
kesên ku ji nîjada a
rî ne, dijîn.

Gelo ewê niha Kur-
dên Iraqê çi bikin?
Barzanî awa bersiv
dide: "Ez li vir im û
ew li wê ne. Dîsa bê-
jim ez ne serokim û
ezê îndî hew bibim
serok. Her tişt qediya
ye, ji binî qediya ye.
Ez dixwazim ku navê
min ji dîrokê bê xe-
rakirin, lê hun rojna
mevan, hun nahelin (...)
Niyeta min tunê ku
ez ji niha pê ve Par-
tiya Demokratîka Kur-
distana Iraqê îdare
bikim an raya xwe li
ser xeta wêbêya vê
partiyê bidim." Dûra
Barzanî bi bîhtengî
qala hin Kurdên ku
li dijî Iranê daneza
nan didin dikê: "Ew
ne meriv in ne jî
Kurd in!" (...)

Serokê pîrê Kurdên
Iraqê, gava ku qala
Kommunîstên Iraqê di
ke, kela wî radibe û
wan ji qirkirin û kuş-
tinên Bakûrê Iraqê
berpirsiyar dike: "
"Kommunîst neyarên
Islamê ne û dixwazin
bi her awayî misil-
manan berî hev din"
Barzanî dixê bîrê ku

wextekî jê re "Mellê
Sor" digotin. "Neyar-
rên min vî navî da-
bûn min. Ez timî an-
tîkommunîst bûm ji-
ber ku ez misilman
im. Di nav pêgirti-
yên min de tu kom-
munîstekî tune bû û
heke yek bûna jî ne
wêribû xwe eşkere
ke "Barzanî gellek a
yetan dike nav mijû
lahiya xwe.

Her çiqas wî sa-
lên dirêj di şer de
derbas kiribe jî, li
xwe mikur tê: "Ez ti-
mî evîndarê edebiyâ
ta farisî bûm, xasma
Hafiz û Saadî û ni-
ha ez gihîştim wan"
Gava ku min jê pir-
sî ka niyeta wî he-
ye bîranînên xwe bi
nivîsîne, li min ve-
gerand: "Ez bawer na-
kim ku ev pêwîst be.
Meriv tenê gavekî
dijî û paşê vedige-
re xweliyê. Tewş e
ku min bibîr bînin.
Qûlên Xwedê divê te-
nê wî têxin "bîra
xwe"

Rast e ku vegera
xweliyê heye. Lê be-
rê vê vegerê di he-
riyê de gerîn jî he-
ye. Ev jî, heye ku Qe-
dera yên ku bawerî-
yeke bêşik bi mezna
hî, pêşverûtî û za-
neyiya "Serok" bawer
kiribûn û dikin be.
Bibê nebê meteloka
pêşiya dikeve bîra
me: "Malxweyê me Om
e, xwelî li serê kom
e!"

□ □

Gerokê Tirk Ewliya
Çelebî di salên 1652-
1653 an li hin navçe-
yên Kurdistanê geriya
ye û di cîldê IVê ger-
nama xwe de dîrûdirêj
qala Kurdistanê sedsa
la XVII an bedewî û
dewlemendiya wê dike.

Me ji gernama wî
keriyek kurt derxist
di kîjanî de Ewliya
salixê Qesra Evdal Xa-
nê Bedlîsî dide. Di
hejmara 2 an de, gero-
kê navdar pesnê bede-
wî û semiyana hemama
vê qesrê dikir. Va yê
dûmahika vê keriyê.

"Di wan deh roj û deh
şevên ku em lê bûn mê-
van, Evdal Xan jibo xâ-
tirê Melek Ahmet Paşa
ziyafetên ewqas şên û
têrûtije da ku kes ni-
kare bi gotina salixê
semyan û debdeba wan
bide. Leşker û muhafi-
zên sê hezar û şest
axayan heta meşalekêş
û seyisan hewand û
têrkir.

Piştî şivê, Evdal
Xan ji paşa re got :
"Çend lewendên me yên
çê hene. Heke dilê
we jî dixwaze kerem -
kin baxçeyê me yê mî-
ranî ku li Meydanê di-
nêre, em temaşa leyisti-
kan bikin. Li ser van
gotinan Paşa kişiya
cîhkî bilindê ji he-
mî warê leyistikar re
serdest û got : "Ka em
binêrin çi ji wan tê"
Li dora meydanê, xelk
gişt rêz bi rêz kom
bûbû û hawilkarê tema

JÎ DÎROKA KURDISTANÊ ...

Ji Gernama EWLÎYA ÇELEBÎ (II)

şê bû. Pêşiyê, mêrxasekî bînavûdeng ku jê re Zengîzer digotin derket hafa Evdal Xan, te vî cilên xwe yê lewêndîyê ku ji çermê reş bûn. Ew erda ber piyê Xan maçkir, diayê xwe kir, û bi lezekî wisa beziya û li dora Meydanê geriya ku hespên rewantir jî nikaribûn bighîjinê. Piştî wê dorgerê, bi wê leza xwe, heta hafa Xan kişiya, navê Xwedê hilda û bi nermî xwe hilavêt hewayê, di hewayê de sê teqle li ser hev avêt û li ser piya ket ciyê xwe yê destpêkê. Di wê gavê de, xwe weke hecîkekî hilavêt û di qasê çawşkênandineke de li hewayê çar caran li dora xwe geriya û çewa piyên wî erdê girt quncikekî. İcar berepaş sê teqlan avêt. Bi nerminiyê wîlo dilivî ku meriv bi dijwarî dikaribû bawer ke ku ji kesekî ev çend hiner bîn (...). Ev lewendê han duwazde şûşan kir du lodên şêş şûşeyên liserhev danî. Bilindahiyên her şêşan ji bejna merivekî dibî hurî. Çil-pêncî gav fi-rekişiya, mîna hespekî pêkolê kir, dûre bi derbekî li ser pêkî hilpêkî weke tîrê ku ji kevan filitî be kişiya û weka brûskê gihîşt ber lodên şûşeyên liserhev danî. Cardin qîriya "Hay" demekî wisa li piya li ser şûşên liserhev danî ma, jibo dilşahi û bextiyariya paşa dia-kir û xwe avêt erdê, wê



maç kir û çû xwe danî quncikekî. Dû wî de hin lewendên din hatin, û her yek, di dora xwe de hiner û marifetên xwe nîşan da. Li Bedlîsê, pişewarî (zenaet) gellek şên û pêşveçûyî ye. Çakûçên ku li wê derê tîrê çêkirin ji yê hemî deran çêtir in. Cûmker ew qas karê xwe rind dinasin ku li ser cûm û qumaşên wan tu şopa drûtîne nayê dîtin. Di rengxane de rengên zer, helesora gulî, helesora xoxî, zerê pahtî çêdikin? Drûvê rengên ku rez û baxçeyên vî bajarî bedew dikin, bi van rengan dikeve. Kârê rengxana yek ji nîşanên sanayiya Bedlîsê yê wekî tîrê kevanên wê yê bînav û deng.

Çavê Melek Ahmed Paşa, waliyê Wanê û zavayê Siltan Mûrad IV, ew çend di dewlemendî û gencîneyên Eydal Xan de ma ku di sala 1655 an de tevî leşkerekî giran ajot ser Bedlîsê, piştî şerekî xurt û bêgîdî perreki bajêr xerakir, şewitand, malên Xan talan kir, kitêbên wî şewitand.

Evdal Xan zane û mênvanîz bû, lê ne mirovdewlet bû. Di dema ku karin û meznahî di qevda şûr de bû, ew çî bigre destvala bû. Yê ku xwediyê xurtahiya şûr û topan bû, avahiyên wî yê bi zanîn û bedewiyê bi salên avakirî di nav çend rojan de hilweşandin, xopan kirin. ▲▲▲

JÎ DÎROKA

-II-

Bi erdçinî û dewarxwedîkirinê hin eşîr û gelkok ji ber pêşveçûniya xwe ya di zanebûnê de an çakiya erdê xwe, ji yên din dewlemendtir û xurttir bûn; dest bi firotin an bedêlkirina mal û dewlemendiyên xwe yên zêde kirin. Bazirganî û şerên nav eşîran liser mal û milkan wisa kirin ku ne tenê hin eşîr ji yên dewlemendtir bûn, lê di nav eşîrekî de hin bi kerî û garanên xwe, bi kolên xwe (yên ku di şer de hatibûn dîlgirtin) ji yên din dewlemendtir bûn. Xwedaniya arizî ya ku di destpêkê de tenê liser kerî û koleyan bû, berebere mal û hebûnên din, heta bigire erd û avê, jî kir nav warê xwe. Meriv îndî ne tenê aza an kole bûn lê wisa jî zengîn an belengaz bûn, newekheviya mal û hebûnê ketibû nava wan. Di nav eşîrê de erd û keriyên çêtir ketin destên hin malbatan ku ew berebere bûn axa û begên eşîrê, xwediyê mal û karîne (îqtîdarê).

Di nav sedsalan de, danûstanên merivên ku ji eşîra xwe ji ber hin sedeman dûrbûne û li cihê din bicîwarbûne û endamên eşîrê sist dibin, peywendiyên wan û cîranên wan çêdibin. Wisajî peywendiyên eşîriyê li cîyê xwe ji girêdanên cemaeta erdê û cîraniyê re dihêle ku ev cemaet hê jî li hin cîyan hene (Hindistan, Asyanavîn, hwd).

Dibe ku meriv xwe ji merivên xwe re, braxweyên xwe re kêmbike, dewlemendî û serdestiya wan qebûl ke. Di cemaeta erdê û cîraniyê de îndî ev peywendiyên braxweyî tune ne û kes naxwaze bi hemdê xwe xwe ji dewlemendan re, ji beg û xwedîerdan re bitelîne, kar û suxra wan bike, ev yek tenê bi zorê dibe. Loma dewlemend, xwedîmal jibo domdariya, serdestiya xwe digihên hev, dewletê çêdikin, supa (ordî) û zindanan datînin ku bi darê zorê, bi tirsê bindestan, gundiyan, belengazan bitewînin, serweriya xwe deynin û ba

jon. Dewletên pêşîn ku liser hîmên koledariyê hatibûn danîn, li Misrê, Mezopotamyayê û liser erdê Kurdistana niha avabûne.

PÊŞÎYÊN KURDAN

Ji nasîna nûvisandinê bivir de Dîroka gelan çêtir tê nasîn. Gelê nûjenên mezin piranî di navbeyna sedsalên 8-12 an de bi tevlihevî û têkilbûna eşîr, gelkok û nijadên cihêreng çêbûne (Fransîz, Ingîlîz, Ispanyol, Rûs). Çêbûniya hin xelkan kevintir e (Çîn, Kore). Di Roheleta Nêzîk de kevintirîn gel Kurd û Gurcî ne. Pêşiyên Kurdan qebîle û gelkokên Mitannî, Kasît, Lûlûbî, Xûrf, Subarû (Zibarî?), Urartû, Kardûx û Med in. Hin ji van eşîran ji demên hereberê de li wê bûne. Gava ku hinên din, wek Medan, di dora sedsalên XI-X ên berî dewrana me (berî Mîladê) li çiyayên Zaxrosê û newalên Dicleyê cîwar bûne.

Di vê benda kurt de em ûnîkarin liser dîroka kevnareya her yek ji van gelkok û qebileyên pêşiyên Kurdan bisekinin. Emê tenê çend gotinan liser hin ji wan bêjin û diyar bikin ku gelê Kurd gelekî kevn e, di nav çend hezar salên dîrokê de bi tevlihevbûn û mehandina eşîr û gelkokên cihêreng çêbûye.

Yek ji kevintirîn pêşiyên gelê Kurd Kasît tînen hesibandîne ku ew di navbeyna hezarsalên 3 û 2 yên berî dewrana me li çiyayê Zaxrosê jiyane. Nûvisarên Elamî û Babîloniya qala wan dikin. Di hezarsala 2 ya berî dewrana me, ew daketine newalên Dicle û Feratê, şerê kurê Hammurabî kirine û hêdî hêdî navçeyên bakûrê Babîloniyayê kirine destên xwe. Di sedsala 18 a berî dewrana me Gendêş, serekê Kasîta, xanedana babîlonî ya yekemîn dixîne û dibe serwerê Kasît û Babîlonîyan. Babîloniya qasî 576 sal di bin destê Kasîtan de dimîne.

KURDISTANÊ...

Ji nvîsarên liser kêlik û ke virên qerexê rê nvîsî dixuye ku di dema Kasîta de erdçini pêşveçûbû û feodalî indî rûniştibû. Serwer û serkar ji komika tenga xanedanê derdiketin. Qoreka (tebeqeka) civakiya din bî karê ol û diyanetê bilî dibû, mabeda xwedî dikir û bi diyarî, gorî û bêşên gundiyan dijîn. Erd bixwe jî piranî di destê "genne" (derebeg) an de bû, gundî di erdê wan de dişuxulîn û parekî ji hatina erdê didan wan.

Kasît, zmanekî nêzê hindû-ewrûpayî dipeyvîn (gava ku Asûrî, Babilonî û Elamî zmanê Samî dişexilîn). Wan xeynî Buriast (xwedanê Bayê) û Şûriyaş, tav û hespê jî diheband. Hin ji mabedên wan li serbajarê wan Dûr-Kûrîgelzû (îro Burca Aqarqûf) gihiştine rojên me.

XÛRÎ Û MITANNÎ

Heçî Xûrî, ew hê di hezarsala 3 ya berî dewrana me di navçeyên Diyarbekr, Bohtan û Herranê de cîwarbûne û di sedsalên pêşînên hezarsala 2 a de dewleta xwe rastkirine, bakûra Sûriyê heta bigirê Filistinê kirine destê xwe. Di sedsala XV a berî dewrana me siwariyên Mitannî ji rohelat tîr û dikevin nav Xûriyan û her du bi hev re Imparatoriya Mitannî ava dikin. Di sala 1460 a berî dewrana me, serwerê Xûrî û Mitanniya Şawşatar Asûrê zevt dike, milkên ji Derya Reş heta Filistinê dike destê xwe û bi cîranên xwe yên Babilonî û Misrî re peywendiyên qenc rast dike. Firewnên Misrê (wekî Nefertitî) ji Mitanniyan jin tînin û keçê xwe didin serwerên Mitanniyan. Piştî kuştina Imparator Duşrata, di sala 1365 an de, Imparatoriya Mitannî berebere jihev dikeve, Asûrî xwe rizgar dike, milkên rojava dikevin bin destê Hititan.

Imparatoriya Mitannî dewletekî leşkerî bû. Xanedanekî Serdar û serkarên Xûrî û Mitannî liser xelkê cotkar û şivanan hikim dikir. Di aliyê pişê (senet) de, Xûrî afirandihên hêja, berbiçav diafirînin. Pişeya Mezopotamya û Hititan ji wan gelek tiştan stendiye.

Di demên kevin de peywendiyên eşîrî û qebileyî ji yêrî din xurttir bûn. Gava ku qebilekî bi şerkariya xwe qebile û eşîrên cîran li ber xwe di tewand û peyderpey dewletekî datanî navê xwe li navê dewletê datanî, ango dewlet ne bi netewahiya (milliyeta) xelkê xwe lê bi navê xanedana serwer di hate nasîn. Lewra, eynî erd geh bi navê "welatê Mitanniyan" geh bi yê "welatê Kardûxan", geh bi yê "welatê Kirtîyan" tê nasîn. Em binin bîra xwe ku ev rêzeçê (adetê) han heta demekî nêzîk jî li pirçîyan hakim bû. Ne tenê Imparatoriya Sêlahedînê Kurdî bi navê xanedana wî ya Eyûbî di hate naskirin, lê ya Imparatoriya Osmanî bi navê eşîra Osmanîyan kete dîrokê.

"WELATÊ KARDAKA Û KURTIYAN."

Yek ji kevintirîn nvîsarên ku qala Kurdan dike kevîrên pêderiyên sumeriyên 2000 sal berî dewrana me ne. Zaneyê fransîz Thureau-Dangin, wan xwendîye. Tê de Sumerî ji "welatê Karda-ka" behs dikin û dibêjin ku ev welat li aliyê "Sû" ye. Bi awê zanayê Ingîlîz Driver, Sû li qerexa Gola Wanê ye. Şerefname kela Sûy li navçeya Bedlîsê nîşan dide. Bi vî awayî, "welatê Karda-ka" hê di dema Sumeriyan de, ango berî 4000 salan navçeya dora Bedlîs, Wan, Çiyayê Zaxros û newalên Zapê bûye. Dergûşa gelê Kurd ev navçe ne, ew di nav sedsalan de ji van deran ber bi rojava (Roha, Entep, Malatya) û ber bi bakûr (Qers, Erzurum) kişiyane.

(dûmahik heye)

Quncikê Marksîzmê

DAXUYANIYA



KARL MARX (1818-1883)

Ji serfên heyama navîn rûniştevanên komava (kommun) yên pêşîn zan; ji vê gel haya (xelkê) bajarî peyayên yekemînên bûrjûwaziyê derketin.¹

Servebûniya (keşfa) Amerîkayê, riya der yayî ya dora Afrîkayê warekî karê nû da bûrjûwaziya ku hildikişîya. Bazarên Hindîstanê û Çînê, destdanîna li ser Amerîkayê, têcîriya mêtîngehî (kolonyal), pîrbûna navgînên (wasîteyên) danûstanê û bi awakî giştî, pîrbûna frotîşkan hilfir û pêşveçûnekî ku heta wê gavê ne hatibû nasîn da bazirganiyê û bi vî rengî, geşbûniyeke zû temîn kir ji birê şoreşgerê cîvaka feodala di nav jihevhatinêde.

Awayê kevnê bikaranîna feodal an karcivayîya (korparatif) sanayiyê têra hewcedariyên ku, bê rawestî, hingî bazarên nû vedibûn zêde dibûn, ne dikir.

Destkargeh (Manufaktur)² dewsa wê girt. Çîna navîna sanayîvan cih ji mamosteyên Juranda stend: parkirina xebatê di nava karcivayên (korporasyonên³) cihê şûna xwe hişt ji parkirina xebatê di nav kargehê (atêlyê) bi xwe de.

Lê bazar bê rawestî mezîna dibûn; hewcedarî timî zêde dibûn. Destkargeh jî têr nekir. Încê hêza hilmûgûlmê û makîne⁴ di hilberîniya (istîhsal) sanayiyê şoreşgerand. Sanayiya me -

zîna nûjen ji destekgehê re serket: çîna navîna sanayîvan cih ji milyonerên sanayiyê, ji bûrjûwayên nûjen re hişt.

Sanayiya mezîna bazara cihanî afirand (xulq kir), kîjan bi servebûniya Amerîkayê hatibû havilkariyê (amadeyiyê). Bazara cihanî bi awakî mucîzewî pêşveçûna ticaretê, deryavaniyê û rê û dirban lezand. Vê pêşveçûnê di dagerê de sanayiyê pêşdetir bir; hingî sanayî, ticaret, deryavanî û rê hesin pêşvedîçûn, bûrjûwazî geşdibû, sermayeyên xwe dehcariyê di kir û çînê ku ji heya ma navîn bermabûn paş ve tam dida.

Bûrjûwazî, em dibînin, bi xwe hilberiyê

(mahsûlê) pêvajoyekî (prosesûsekî) dirêjê geşbûniyê, yê rêzekî şoreşên di awayên hilberînê û danûstanê ye.

Her gîtê geşbûniya bûrjûwaziyê bi xwe re pêşveçûnekî sîyasî ya hevber dianî.

Bûrjûwazî, koma sosyal a ji aliyê zorkariya feodal êşandî, komela çekdara ku di komavayê de bi xwe xwe îdare dikir⁵, li vir komara bajarîya biserêxwe⁶, li wir rewşeya sêyemîn a bêşdar û suxedarê monarşiyê⁷; pişt re, di dema destkargehiyê de dijgiraniya xanezadiyê (zadeganîyê) di manarşîya feodala tewna (mutlaq) de, kevirê mihingê monarşiyê mezîna bûrjûwazî,

PARTÎYA KOMMUNÎST

ji danîna sanayiya mazimû bazara cihanî bivirde serweriya (ha kimiyeta) siyasî ya tenagîra dewleta tem sîlîya nûjen xist destên xwe. Karîna (iktidara) dewletî ya nûjen tenê komcivekî (komîtekî) barkiriyê bi gerandina karên tevîhevên çîna bûrjû wa ye. Bûrjûwazî di dîrokê de rolekî soreşgerî bilind leyîstîye.

Li herderê ku karînê bidestxist, peywendiyên feodal, paderseri û bestewînî (îdîlik), hemî girêdanên cihêrengên ku mirovê feodal digîhînin serdestên wî quraft; di dewsa wan de di nav mirov û mirov de dervayî kêrhaya (menfaeta) sar, xwestekên hişkên "heqdana pêşîn" tu girêdan nehişt.

(dûmahîk heye)



F. ENGELS (1820-1895)

1. Hê di dawiya sedsa la X^a de, lê bi hîmtî di sedsala XI^a de, li Almanyê "tevgerekt bajarvanî" tê dîtin. Bajarok, bajar û şaristanên nûza, yê ku heta hingê di bin nî rê abort û hiqûqî yê began de bûn, digîhên hev, hevdesaz dibin jibo bidestxistina a zadiya xwe (coniuratio civium an Schwurverband). Kel û dizên pêştî (dtwar, paşê sûr: Pfahlbau, Stadtmauer) nîşanên serxwebûn û xweseriyê (otonomiyê) li Almanyê ji sedsala XI^a ne; niha jî pirtîcar ew di derefşên şaristanan de xuya ne (nîşeya Engels).

2. Destkargeh (mant-faktur) derbasiya kargeha pîşewarî (zeneatkarî) ber bi sanyatî ya mezîna nîşan dîke. Hin ji karkeran

li wêderê di bin seroktîtiya karxweyektî (patronektî) bi tenê, li ser dezgehektî ku tîndî ne yê wan bû di xebitîtn.

3. Korporasyon (ji latîntî korporarî, xwê di koman de civîtn) komelên pîşewarî (zeneatkar) û ostayan jibo tenzîmî kirîna karê wan û parastîna menfaetên wan; tevayî ya kesên ku bi eyntî kartî bîlî dibî (n.w).

4. Maktne-aletî hilberîntî (istîhsal) yê û peywendiyên mirov û heyoka karê wî guherandîna heta hingê aletî bi destên mirovî digîriyan û mirovî çêkerê tevayîya veguhêrtîna dendê (maddê) bû. Bi maktne, sazgeriyê hingî diçe bixwe-meş aletî digîrtîne, karkerî tîndî "ji dûrve", bi renektî beşktî (qîsmî) tîkilî dibe.

Maktne hilmûgulmê, bi karantîna ktîjanê tenê berbi 1790 an li Ingilîstanê belav bû, di cîhî ktî de tenê dûmahtka maktne-aletî: lê bi dewsgirtîna hêzên livkarên rêzeçî (adettî), wê hilmektî xurtî dida şoreşa sanyatîyê.

5. Bi vî rengî, rûniştevanên bajaran li Italya û li Fransayê, piştî jî xwediyên feodalî kirîtn an qurafîna mafên pêştînenî dareya serêxwê, ji ce maeta xwê re navê ce maeta bajartî datantî. (nîşeya Engels, çapa almanî ya 1890 an).

6. Wektî li Italya û Almanyê (nîşeya Engels, çapa almanî ya 1890 an).

7. Wektî li Fransayê (çapa ing. ya 1888 an).

RINGEHÊN

DESTPÊKIYÊN

FELSEFÊ

georges politzer

III. FELSEFE ÇÎ YE?

Di zmanê xelkê de gava ku fîlozof dibêjin tê fehm kirin an kesê ku di nav ewran de dijî, an yê ku li aliyê xweşikê tiştan dinêre, ewê ku "xem naxwe". Lê, vajîyane, fîlozof ew e ku dixwaze ji hin pirsan re bersivên (cevabên) ronak bîne. Heke em bînin bîra xwe ku felsefe dixwaze îzahekî bide pirsên gerdûnê (çihan ji ku tê? em bi kû da diçin? hwd...) tê dîtin ku fîlozof bi gellek tiştan bilî dibe, û dijê ya ku tê gotin, "pirr xem dixwe".

Wisa be, emê jibo danasîna felsefê, bêjin ku ew dixwaze gerdûnê (kaînatê) xwezayê îzahke, ku ew lêkolîna pirsên giştîtir e. Bi pirsên kê m giştî zanistî (ilm) bilî dibin. Felsefe wilo dirê - jîneya zanistîyan e, himin ew li ser zanistîyan hîmdar e û bi wan re girêdayî ye.

Emê hema biserkevin ku felsefa mark sîst azînekî (metodekî) safîkirina hemî pirsîyaran tîne û ku ev azîn bixwe bi materyalîzmê ve girêdayî ye.

IV. FELSEFA MATERYALÎST ÇÎ YE?

Di vê tengê de jî tevlihevîyekî heye ku me divê pêre diyar kin. Di zmanê xelkê de gava ku materyalîst tê gotin, tê sehkirin kesê ku tenê li dû kêfên dendî (maddî) digere. Bi gotina "materyalîzm" leyistinê-di vê gotinê de giliya "matiere" dend heye - jê re têgiştinîkî (manakî) ji binî nerast tê dayîn.

Emê bi hînbûna materyalîzmê - bi têgîştîniya wê ya zanistî, mana wê ya rastî bidinê. Emê bibînin ku, materyalîst bûn nabe asêyî ku meriv xwe diyê mengîyekî (idealekî) be û jibo serketina wê şer bike.

Me got ku felsefe dixwaze îzahekî bide pirsîyaran giştîyên çihanê. Lê, di doma dîroka mirovahiyê de, ev îzah timî eynî ne bû.

Mirovên pêşîn li îzaha xwezayê, çihanê geriyan, lê ji heq ne hatin der. Yê ku dest dide îzaha çihanê û qewimandinên dora me, zanistî ne; mako servebûnîyên ku zanistîyan pêşvebirin gellek teze ne.

Nezaniya mirovên pêşîn wisa asêyekî bû jibo lêgerînên wan. Loma, di doma Dîrokê de, jiber vê nezanîyê, em dibînin ku ol (din) peyda dibin û dixwazin ew jî çihanê îzah kin, lê bi hêzên (qewetên) serxwezayî. Ev îzaheke dijîzanistî ye hêdî hêdî nav sedsalan de, ewê zanistî geş bibe, ewê mirov bicêribînin çihanê bi kiriştên dendî (maddî) yên cêribandinên zanistî îzah kin û ji vê yekê ye, ji vê daxwazê bi zanistîyan îzaha tiştan e ku dizê felsefa materyalîst.

Em dikin, di rûpelên ku tên de, hînbûn materyalîzm çî ye. Lê ji nihade me divê bidin hişê xwe ku materyalîzm ji îzaha zanistîya gerdûnê dertir tiştên nîn e.

Di hînbûna dîroka felsefa materyalîst de, emê bibînin çiqas şerê dijî nezaniyê zehmet û dijwar bûye. Divê em bibînin ku di roja îro de ev şer hê neqedîya ye jiber ku materyalîzm û nezaniya dom dikin li teniştê hev dimînin.

(dûmahîk heye)

GULÊ, DAYIKA ŞOREŞGER

Xwendevaneka me ji me re nameya jêrîn şandiye.

Ez jineka Kurd im. Kovara weya jêhatî kete destê min. Hûn nizanin çiqas dilê-min geş bû. Gellek ez serfiraz bûm, wextê ku min kovara we ya hêja dît. Di rûpela rizgariya jinan de min derdê xesî û lê-xistinê xwend, mi jî xwest ez ji xuşkên xwe re, brayê xwe re meselek bêjim, li ser xebata jinên kurd.

Her wekî hûn dizanin jinên me gellek stem û nexweşî dîtin. Tevî bela û mûsîbetên ku hatibûn serê wan, wan dîsa jî di şerê xelkê xwe de cîhê xwe digirt. Çîroka me ya piçûk wê ji we re bide zanîn, çawa xuşkek me li Kurdistana bindest xebata xwe bi hêvî û bisebr kir.

serpêhatiya gulê

Gulê jinek dilovan û welatperwer bû. Jinek nezan û nexwenda bû, lê hezkirina mîlletê ketibû dilê wê bi awayekî xurt. Du kurê xwe kir goriya şoreşa kurdî. Wextê ku ji xura ma, rîya kurên xwe berneda û xwe kir nav şerkera, nizanbû bi kîja awayarîkariya wan bike. Nanê wan dipat, cilê wan dişûst, xwarina wan çêdikir, ji hemiyara dayîkek bû.

Rojek leşkerên kurd diviyan nameyek bigê hînin hevalên xwe, li cîhek dûr hizra xwe dikirin kî bişînin-kî neşînin. Wexteke Gulê hat pêşiya wan



û ji wan re got: "Kurên min îşê we hêsaniye, nameya xwe bidine min û ezê bigêhînim". Li hevdû nihêrin û jê re gotin: "Yadê ma tu dikarî rojêk peya herî?". Gulê: "Ez gorî we bim, ma ez ji we çêtir im? Ez nikarim tîfing hilgirim, lê lingê min bi xurt in".

Namê bir û gihand. Ji wê rojê bişûnda hemî leşkera Gulê naskirin û rûyê wê yê bikên, bîra dayik û xuşkê wan dihanî

bîra wan. Navê wê kirin "Berîd" û kêfa wê gellek ji vî navî re hat. Çûn û hatinên wê gellek bûn. Eskerê bêbext jê şik kirin û rojek wê girtin. Avêtin hepsê û wê tazî kirin, gellek êşandin tiştê nebûyî anîn serê wê. Lê nav hemî zûlm û êşandin Gulê devê xwe venekir. Tade û cefayên ku Gulê kişandibû çavê wê netirsandibûn, wê navê leşkerên ku li ber dilê wê ji jiyana wê birûmettir bûn, neda, li wan gilî nekir. Piştî nehmehe girtîgeh û zîndanê û jiber jan û êşîkên ku li wê der girtibû Gulê mir, bi xowna Kurdistaneke AZA!...

Jineka Kurd



NETEWEEKÎ KU LI YEKÎ DIN ZORDESTIYÊ DIKE, BIXWE JÎ NE AZAD E.

Karl MARX



INTERNASYONALİZM JIBO GELEKÎ BINDEST, XWE JI NÎRÊ EMPERYALİZMÊ Û ZORDESTIYA NETEWEEKÎ RIZGAR KIRIN, WELATEKÎ AZA Û SOSYALÎST AZA-KIRIN E. □ □

Xebata Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê li Fransa

Ev bûn nêzî du salan ku xwendekarên Kurdên li Fransayê di bin navê Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê li Fransa (YXKF) dixebitin. YXKF komeleyeke serbixwe ye, ne bi KXKE a pêgirtiyên PDK a Barzanî ne jî bi AKSA ya hevalbendên Talabanî ve girêdayî ye. Hê di destpêkê de, di dema sazûna xwe de YXKF da zanîn ku ew "dixwaze berî her tiştî di nav rêzên xwe de hemî xwendekarên welathiz, baweriyên wan ên siyasî çî dibe bila bibe, bicivî

ne, jî wan re bibe maleke hevrayî û komelî. Ew jî Kurdên ku ji çar perçeyên Kurdistanê tèn re îmkana hevûdinnaskirinê, jî hevfehmkirinê, jihevhişkirinê dide da ku dewsa valahiyên ku çend dehsalên cihêjiyan û perçebûna welatê me dane peydakirinê piçek be jî dagire, li nav şoreşger û şerkarên misteqbelên hereketê Kurd jî niha de girêdan û têkiliyên dostanî yên xurt bide saz kirin"

Armanca vê benda kin ev nîn e ku dûrûdirêj li ser dîrok û bername ya YXKF bimîne, lê bi kurtî kirin û xebatê wê bide naskirin. Te nê em bêjin ku biryara (qerara) sazkirina komeleyekî serbixwe bi sîvikahî nehatiye dayîn. Berî vê biryarê, hevalên Fransayê bi mehan jîbo parastina yekîtiya tevgera Xwendekarên Kurdên Ewrûpayê ser kirin. Li ser çî bingehî? Ser çend bingehên serreke: 1-Maslehetên hindurî û dervayî yên serê rizgariya gelê Kurd li Ewrûpayê komelekî yekbûyî û xurt dixwaze ev komele divê bibe

2-Komel nabe ku bibe dûvika hêzeke siyasî ya perçeyekê Kurdistanê.

3-Tenzîmeke demokratîk û federalî

4-Pêwistiya Serê îdeolojîk di nav rêzên komela yekbûyî da. Divê ku xwendekarên pêşverû şoreşger li hemberî baskên paşverû, diz, çar alîxur û keysperest şerêkî xurt bikin, serokîtiya komelê têxin destên xwe, komele jî peyayên diz, firotî û yên ku tu eleqa wan û xwendekariyê tune ye paqîj kî; hilm û vejîneke nû bidin tevgera xwendekara Kurdî, wê di nav tevgera xwendekara pêşverûya cihanî de têxin xwediyê cîyekî berbiçav.

Xeynî derxistina belavokan, hevalên Fransayê, jîbo bicîhanîna vê armancê di meha temmûza 1976 an de nemînendeyên "Komîta Amadekirdin" û yên KXKE li Parisê civand. Lê jî vê civînê tiştêkî misbet derneket. PDK a Iraqê jî, hevalên Tala-

banî jî biryara xwe jî berê de dabûn, heryekî, jîbo maslehetên xwe yên piçûk û bi bîmesûliyetêke temamî, dixwastin bibin xwediyê komelekî di emr û dûvika wan de. Û pêlekî şûnda perçebûna Komela Xwendekarên eskere û resmî bû. Piştî vê yekê ya ku xwendekarên Fransayê nehatin leyistika "Kî ne bi Talabanî re be Barzanî ye", "Kî ne Barzanî be hevalê Talabanî ye". Ewan jî xwe re riyekî nû, pêşverû û serbixwe danîn; keysperestî, bîmesûliyet û bêciddiyeta her du komalan jî xwendekarên Kurdên Ewrûpayê re diyar kirin.

Di van du salan de li Fransayê çî xebat hate kirin?

Di warê tevgerêdan û tenzîmî de berbi rastkirin û pêşvebirina zîhniyet û bingehên demokratî de gavekî mezîn hate avêtin, her çî

gas hê armanca demokra-
tik dūr be jî. Di YXKF
hemî pêplûkên hiyerar-
şiyê wek "serok", "sekre-
ter", "komîte" hatine
hilanîn. Xebat li nava
"komên xebatê" hatiye
par kirin û her endame-
kî bi hindikî di kome-
kî de kardike.

Jibo gihandina siya-
sî û çandîya endamên
xwe YXKF di cîgehê xwe
yê Parisê de pirtûkxa-
neki merkezi saz kirîye
tê de bi kurdi, tirkî, e-
rebi, fransîzî, inglîzî
pirtûk hene liser pîr-
sên cihê-cihê. Dîsa ji-
bo vê armançê semîner
hatin çêkirin liser di
roka Kurdîstanê, liser
zman û edebiyata Kurdi
demekî dersên zmanê
kurdi û zmanê fransîzî
jî hatine dayîn. Hin he-
val jî heftê carekî di
civîn û bihevîre pirtû-
kên îdeolojîk û liser
dîroka tevgerên sores-
ger dixwînin, mînaqese
dikin. YXKF hê di belav-
voka sazûna xwe de "gi-
handina endamên xwe" jî
xwe re karekî himî di-
hesiband.

Di warê xebata nav
karkerên kurdên ku li
dora Parisê dimînin jî
hin tişt hatine kirin.
Lê jiber hin sedeman
(kêmasî û belavbûna
karkerên kurd li Parî-
sê, kêmaniya mîlîtanên
gihîştîyên ku dikarin
bin di nav karkeran de
xebatekî siyasî bikin)
ev xebat hê di pêplûka
destpêkî de ye; pêşvebi-
rin û xurtkirina wê
ferz e.

Pirtûk, afîş û belavok

Jibo rewşa gelê Kurd
bi fransîzan û xwende-
karên biyanîyên ku li
Fransa dixwînin bidin
naskirin, endamên YXKF
her hefte li ber
derê Zanîngehê Pari-

sê (û carnali baja-
rên din)"stand"ên pîr-
tûk û afîşan çêdikin,
li ser diwarên kuçe û
kolanên berbiçavtirên
Parisê sloganên dîni-
vîsinin, tevî şev û mî-
tingên çandî û siyasî
yên tenzîmên pêşverû
dibin. (Partiya Sosya-
list, Partiya Sosyalîs-
ta Yekbûyî (PSU), Lut-
te ouvrière, hwd.)

Di nav du salên xe-
batê de 12.000 afîşên
li ser Kurdîstanê li
çaralîyên Parisê hati-
ne zeliqandinê. Ji be-
lavvoka ku li dijî zor-
destiya ku rejîma Irâ-
qê li gelê Kurd dike
bi tevîbûna komeleyên
Xwendekarên Tirkîyê,
Iran, Iraq, Fransa û
federasiyona xwende-
rên Amerîka Latînê
hatiye çêkirin, 18.000
hatine belavkirin.
Belavokekî jî li ser
rewşa gelê Kurd li
Sûriyê çêbûye û jê
5000 belavbûne. YXKF
Belavokeka agahdariya
gîştî li ser Kurdîsta

nê pêk aniye û jî wê
di şev û mitîngan de
10.000 belav kirîye.
Dervayî wan, bi zmanê
Kurdi jî li ser pîr-
sên cihê (sazbûna
YXKF e, biryarên civî-
nan, serê Barzanî û
Talabaniyan) hwd..)
belavok çêbûne.

YXKF li ser rewşa
Kurdîstanê pirtûkoke
32 rûpel bi inglîzî
û fransîzî çêkirîye.
Ji çapa 1977 an 1000
hejmar hatine firotan
an şandin jibo roj-
name û sefaretan! Pîr-
tûkoke dîni di bin na-
vê "Perçiqandina Gelê
Kurd li Tirkîyê" derke-
tiye. Ew 20 rûpel e.
Ji çapa fransîziya pê-
şîn 700 hatine firo-
tan, çapa diduyan der-
diketiye û inglîziya
wê jî di çapê de ye.
Gellek rojnamevan û
nivîskar di nîvîsarên
xwe yî li ser Kurdan,
agahdariyên xwe jî van
her du pirtûkokan sten
dine.

Şevên çandî û folklorî

Şaxê dinê karê dan-
naskirina Kurdan, çêki-
rin û tevîbûna şevên
çandî û folklorî ye.
Koma govend û dîlanên
YXKF bi arîkariya deng-
bêj û tembûrvan Temo
heta niha gellek kon-
serên serbixwe daye û
wisa jî tevî newrûza
Xwendekarên Îranî, Şeva
Pîstegiriya Arjantînê,
Şeva Xwendekarên Tirkî-
yê, mitînga Komela Fra-
sa-Kurdîstan û cejna
"Lutte Ouvrière" bûye.
Ev konser hatine eci-
bandin û hizkirinê.

Xebata du sala bi
çend rêzan diyar kirin
ne hêsa ye. û em nika-
rin bêjin ku her tişt
li Fransayê mikemmel

e. Kêmasî, xeletî û sistî
hê hene.

Em tenê dixwazin ni-
şan din gava ku çend
xwendekarên Kurd bi
dilsozî, destê xwe bi-
din hev û hinek ji wext
û perên xwe fedakarî
bikin dikarin, bê arîka-
riya tu hêz, partî
grûbên siyasî, jibo ge-
lê xwe xebatekî qenc
bikin. Heye ku xwende-
karên Welatên din jî
çav bidin me, xebata xwe
bi edîlinin û hê jî me
jî derbas bibin. Bila
beza nava me ya Xebat
û xizmeta xelkê be.

Komekî
Xwendekarên Kurdên
Fransayê



ENIYA XWENDEKARAN PIRSA AKSA

Tevgera Xwendekarên Kurd li Ewrûpayê demekî tarî û dijwar derbas dike. Perçebûn, palemikên hindurî, belawelayî hêzên wê yên jiyaneqels kirine. Gellek xwendekarên dilsoz, welat parêz, soresger ji xwe re li rêkî digerin ku ji van tariyan derkevin, hevdesaziyeke xurt bê pêkanîn û ji şerê rizgariya gelê Kurd re xizmetekî bê kirin.

Di hejmarê 1 a de, em li ser Komela Xwendekarên Kurd li Ewrûpa (KXKE), "Komela kevn" ma bûn; me xwezaya wê bi xêzên stûr diyar kiribû gotibû jibo çî ev Komele, ku iro di bin qemçika PDK a Iraqê di nav destên kesên keysperest û paşverû bi kêrî xebatekî ciddî nayê û asêyîyek e li ser riya pêşveçûna tevgera Xwendekarên Kurd. Tê de çibigre tenê Kurdên Iraqê yên bi PDK ve girêdayî ma ne û xeynî navêkî vala tu tîstekî wê nemaye! Emê di vê hejmarê de, bi kurtî li ser pirsê AKSA yê bîmînin.

Piştî du salên jiyaneke sist û tijî dijhevî, Komela Xwendekarên Kurd le Derwey Welat (AKSA) niha demekî jihevketin û pelişandinê dijî. Di Kongera wê ya dawîn de pîraniya endamên wê yên ji Kurdîstana Tirkîyê û hin ji Kurdîstana Îranê xwe ji heval û hevalbendên Talabanî cihêkirin. Bi vî awayî hevî û xewnên ku hin hevalên dilsoz û pêşverû bi dilekî pak di tenga AKSA yê de xwedî dikirin hilweşiyên.

Ev perçebûn û jihevketin di cîhkî de nayerevîn bû, miqedder bû û jibo pêşdîtina wê kehanet ne pêywîst bû. Gellek kesan hê di destpêkê de bala Xwendekarên pêşverû li ser vê yekê kişandibû. Minakî, di belavoka xwe ya kanûn 1976 an de Yekîtiya Xwendekarên Kurdîstanê li Fransa awa digot; "Bi veqetandin û sarkirina Komeleyekî nû, hevalên K.X.K li Derveyî Welêt mes'ûliyetekî mezin dan ser milên xwe û derî li perçebûn, hûrbûn û belabûna tevgera xwendekarê kurd vekirin. Bi hevaltî û girêdanên digel "Yekîtiya Nîştimanî" keysperestiyekî ecêb kirin û bi vî awayî hinek milîtanên Kurd ên pêşverû şaşkirin, kirin xeletiyê. Em bawer in ku dê ew bi xwe jî di demekî ne pirdirêj de bi tevger, lihevkerin, kumguhartin û bêistiqrariya hevalbendên xwe heyirî û ecêbmayî bîmînin û tev-kariya wan nikare pîr dom bike!"

komelekî mirî-za

Sedemên ku ewê rojekî AKSA yê jihevexistina hê di sazkirina vê komela mirî-za de mewcût bûn. Di tahlîla dawîn da, AKSA hate saz kirin jiber ku Yekîtiya Nîştimanî dixwast ku komeleyekî ya di bin kontrola wê de hebe. Ji 1969an bi şûn de KXK li Ewrûpa ji binî ketibû destên PDK a Iraqê. Di şûna ku bi xwendekarên pêşverû yên Tirkîye, Iran û Sûriyê re şerekî îdeolojîk û siyasî xurt di nav rêzên vê komelê de bikin û wê ji destên PDK ê derxin, ew jî di tevgera xwendekarî de cîhekî li go-ra hebûna xwe bigirin, hevalên Talabanî bi lez û bez û bi bîmesûliyetiyeyeke temamî komeleyekî taybetî danîn ku tê de dikaribin bi bin hakîmê mutlaq. Hînbûnên sala, metodên ne demokratîk bi derbekî wînda nabin: Talabanîst jî wekî Barzanîstan timî bi çavên "serokên tevgera kurd, berpirsiyarên şoreşa Kurdistanê" li xwe dinêrin, meznahî, serwerî û serokatiya tevger an komelê weka ku mafekî (heqekî) wanê zikmakî, xwezayî (tabî) be. Ew tucar ji kêrta xwe naKevin û Kurdên perçeyên Kurdîstanê ên din, li nik wan, tenê dikarin bibin dūajoyên ku fermanên "serokatiya şoreşê" bicîh bînin û jibo "arîkariya şoreşê" bixebitin.

Gellek hevalên ku bi gotin û danezanên wan ên "çep" xapiyan,

hinên din ên ku ji awayên paşve-
rûyên serokatiya KKK e Ewropa
nefret dikirin, nedixwastin îndî
sîya Barzanîstan bibînin, bawer
dikirin ku ewê bi dijwarî be jî
dikaribin di AKSA yê de xebatekî
pak û pêşverû bikin. Di nav du sa-
lên tevkarîyê bi çavên xwe dîtî
ku ne tenê karekî nayê kirinê lê
ew tenê ji keysperestî ya Talaba-
nîstan re dibin xêlî û "temînatê
ke" çep! Îro îndî rastiyên jêrîn
nayên veşartin:

1° Li ser "xwezaya pêşverû" ya Ye-
kîtiya Niştimanî kêm kes hê hêvî
yan xwedî dikin û xewna dibînin.
Yekîtiî ne tenê nikaribû tevgera
çekdarî û berxwedana siyasî li
Kurdîstana Iraqê vejîne lê ji
destê siyaseta keysperest, bêbin-
geh û bêbasîreta serekên xwe di
şerê heyîn û neyînê de ye. Wekî
ku dihate pêşdîtin Sûriye û Iraq
li hev tîn û arikariya Asad ewê
li ser wan bê birîn. Piraniya se-
rekên Yekîtiyê îro girtîyên PDK
ne û Yekîtiî li dû berpirsiyarên
PDK ye jibo wan bide berdan. Tala-
banîyê "şoreşger" li Iran e û Sa-
vak pê qenc dizane. Xwezûr û ma-
mosteyê wî Ibrahîm Ehmed geh li
Tehran, geh li London geh li Şamê
ye. Di vî tengasîyê de hevalên Ta-
labanî carekî din dixwazin bi
Bexdayê re lihevbin; lê herwekî
ew ne hêzekî berbiçav in Bexda-
guh nade wan û tawîz nade.

Ev rewşa han, bixwaze nexwaze
ewê xwendekarê pêşverûyê ku ji
keysperestiyên nihayî û borî yên
Talabanîstan nefret dikin ji
AKSA yê dîr bixîne û AKSA nikare
van xwendekaran -ên ku piraniya
xwendekarên Kurd li Ewropa ne-ku
li derveyî çembera Talabanî-Bar-
zanî ne, bigihîne hev. Ev bêkarîna
ku hê di sazûna wê de hebû îro
îndî piştî du salan qenc zelal
bûye.

2° Bi xebata xwe ya du salên da-
wîn jî AKSA ji xwendekarên Kur-
dên Ewropa re mîsalekî nû, misbet,
demokratîk ne anîye. Xebat dîsa
wekî dema komela berê, derxistina
çend belavokan e û çêkirina New-
rûzan e. Ew jî ji bin serê "Komî-
ta Birêvabirî Giştî" ye ku benên
wê çend kesên eyan dikşînin. Karê
piraniya endamên din "fîguranî"
ye, ne bi awayên awaha ye ku ewê
şoreşgerên wêbêyê bigihîjin.

Di milê din de tevgera xwende-
karên Kurd ji tevgera xwendeka-

rên cihanî ji berê bêtir tecrît
bûye, ne di forumên navneteweyî,
ne di festîvalên xortanî yê de
dengê Kurdan nayê bihîstin.

3° AKSA, liser bingehê "îdeolo-
jîk" ê "çepîtiyê" saz bû, liser
xwezaya vê "çepîtiî" yê bihevke-
tin miqedder bû. "Şoreşgerên" bûr
jûwazîya piçûk, maoîst, antî-kommu-
nîstên veşarî û şermezar û mîlî-
tanên sosyalîst nikaribûn demekî
dirêj li ba hev bimînin û bihev-
re bixebitin. Û ev dijhevîya dest-
pêkî di kongra dawîn de derbû,
teqîya.

4° AKSA di bin tahakkuma Yekîtiya
Niştimanî de ye û bi "xwendeka-
rên ebedî" û "Talabanîstên neto-
bedar" re kap avêtin tewş e. Wan
jiyana xwe bi pirsên "nîzam" û
"destûr" an derbas kirîye. Bi wan
re serî nayê derketin û islah û
nûve kirina AKSA yê ne mimkin e!
Çi bikin?

Mij û moraz hêdî hêdî firediki-
şin û hewa siyasî berbi sayîbûnê
diçe. Şertên ji nûve hevdesazki-
rin û tenzîma tevgera xwendeka-
rên niha ji yên berî du-sê salan
çêtir in. Xuya ye ku jiber paras-
tina kêrhayên (maslahatên) xwe
PDK û YNK ewê timî bicadînin ku
her yek xwediyê komelekî bin. Is-
lah kirina KXKE û AKSA xewnekî
tewş e! ne mimkin e! Divê ku xwen-
dekarên pêşverû û demokrat liser
bingehên federalî û demokratî
Konfederasyoneke bikêrhatî, bibin
geh, ji keysperestî, leyistikên sî-
yasîyên piçûk, dîr, antî-empereya-
lîst, antî-feodal saz bikin. Tê de
xwendekarên hemî perçeyên Kurdis-
tanê dikaribin bi zihniyeteke de-
mokratîk û bratî kar bikin, xwe
hînî şerê şoreşgerî bikin û şûna
xwe di şerê rizgariya gelê Kurd
û di tevgera pêşverûya xwendeka-
rên cihanê de bigirin. Divê ku in
dî tucar, tevgera xwendekaran ne-
be leyistoka partiyeke perçekî
Kurdistanê. Di vî warî de berpir-
siyarîyeke giran dikeve ser mil-
ên hevalên pêşverû, yên ku di kon-
gra dawîna AKSA yê de ji heval û
hevalbendên Talabanî qetîyane. Do-
za serokatiya AKSA kirin tiştêkî
nade. Divê ku ew xwe bigihînin
xwendekarên şoreşgerên ku li he-
mî welatên Ewropayê (Fransa, Swêd,
Italya, hwd..) zehf in û xebateke
arîzî dikin û bi hev re karekî
hevrayî, pêşverû, qenc pêk bînin,
tevgera xwendekaran têxin ser ri-
yekî têkûz. Dem zûda hatiye!

MİRINA EREB ŞEMO

Nvîskar û şoreşgerê kurdayî navdar Ereb Şemo roja 29 ê hezîranê li Erivanê mir. Xelkê Erivanê û dorên wê Kurd û Ermenî heta 3 ê tirmihê li ber tabûta wî ya ku li mala Xebatkarên pişeyê Ermenîstanê hatibû rastkirin bihurîn û lê silava dawîn kirin. Cenazê wî li Panteona Erivanê bi amadabûna serekên PK a Ermenîstanê û dewsgirtiyê Şerekê Sovyeta Komara Sosyalîsta Sovyetiya Ermenîstanê hate veşartin.

Ereb Şemo kevntirîn û navdartirîn nvîskarê Kurdên Sovyetîstanê bû. Ew di sala 1897 a li gundê Sûsizê, li dorhêla Qersê ji diya xwe bûbû. Bi arîkariya bext û wisa jî ji ber zîrekî û ezma xwe çû xwendegahê. Di navçeya tevlihev û pirneteweyî ya Qersê de hê di zarokahiya xwe de hînî tirkî, rûsî û ermenî dibe û di salên şerê cihanê Yekan de, he ta 1916 an di alayekî Kazakan de **wergeri** (tercimanî) dike. Berî wî bi salan şivanî kiribû.

Di sala 1916 an de guherandinekî **mezin** diqewime di jiyana wî de. Ew di kargehên çêkirina rêhesin de rastî bolşevîkan dibe bolşevîk pê binêzikî bî lî dibînin û wî wekî mîlîtanekî şoreşger digihînin û dişînin a liyê Sariqamişê jibo xebata şoreşgerî. Li wê derê çendekî di girtîgehê de dimîne. Lê indî ew bolşevîkekî xurtî xwedî bawerî ye. Jixwe hê disala 1918 an de ew dibe endamê Partiya bolşevîka û di nav rêzên Şerkarên Sor de şerê leşkerên dijî-şoreşgerên Spî dike.



Ereb Şemo di warê rastkirina sovyetan li nav gund û eşîrên Kurdên Kafkasyayê xebatekî gellek berbiçav bicîhaniye û heta jê hatiye jibo qewîkirina rejîma Sovyetî şer kiriye. Kengî Sovyet indî bicîh dibin, şerê hindur bi serfiraziya leşkerên Sor diqede, ew ji 1924 an bişûnda xwe dide xebata pêşvebirina cemaeta Kurdên Sovyetîstanê û li Ermenîstanê cîwar dibe.

Wê demê di nav wan Kurdên ku hê di tariyên heyama Navîn dijîn yên ku bi xwendin

nvîsandin dizanîn bi tiliyên destekî dihatin jimartinê. Berî her tiştê diviya bû ku jibo belavkirina xwendinê elfabeka kurî dî bihata çêkirinê. Bolşevîk û Kürdhizê file Lazo jibo zaroyên koçerên Kurdê re li Tîflîsê xwendegehekî vekiribû û wan bi elfabeya fileyî hîndî kir. Lê ev elfabe qet li zmanê kurdî nedihat û hînkirina wê dijwar bû. Dawiyê Bolşevîk vî karî didin ser milê zaneyê navdar Maragûlof û Ereb Şemo jî arîkariya wî dike; elfaba latînî di sala 1929 an de tê pêkanîn

ŞERÊ HÎNBÛNÊ

Gava ku rejîma Sovyetî jibo gihandina mamosteyên Kurdî, li Erivanê "Texnîkûma Kurdî ya Pedagojî ya Pişt-kafkasyê" vedike, Ereb Şemo dibe serekê wê yê pêşîn. Di wan salên "şerê hînbûnê" de, Fakultê karkerî ya rex Instîtûta Rohelatnasi ya Zanîngeha Lenîngradê di bin serokatiya Orbelî dest bi gihandina kadroyên kurdên pêşîn dike. Erebê Şemo di vî eniya şer de, di şerê çandî de jî amade ye. Ew ji 1931 an bi şûnde çend salan li

ser dîrok û zmanê Kurdî dixebite, dibe doçent, rêzmanekî kurdî pêk tîne û lêgerîneye ke kurt liser "Pirsê derheqa feodalîzmê na va Kurda de" derdixe.

Lê bêgûman yê ku na vê Erebe Şemo li dervayî cemaeta Kurdayî Sovyetiyê belav kiriyê xebata wî ya wêjeyî (edebî) ye, romanên wî nin. Di van romanên de jî ya pêşîn, Şivanê Kurd jî hemiya bêtir nav daye. Ew liser jiyana Erebe Şemo, zarotiya wî, jiyana koçerên Kurdên wê demê ye û di sala 1935 an çapbûye. Di eynî salê de Şivanê Kurd bi zmanê rûsî û gurcî û dûre bi

gellek zmanên din der tê û Erebe Şemo navdar dibe.

Derî Şivanê Kurd, Erebe Şemo hin romanên din jî afirandiyê. Ji wan Berbang dîsa liser jiyana wî ye lê Dimdim romanekî dîrokî ye û liser Parastîna Kela Dimdimê û şerê Kurdayî jibo rizgariya wan e di sedsalê XVII a de. Dimdim sala 1966 li Erîvanê bi Kurdî derketiyê û dûre bi zmanên sovyetiyên din û wisa jî bi çekî derketiyê. Tîraja çapa rûsî ya 1974 a 100.000 e. Çapxaneyên Komara Ermenîstanê di sala 1976 an de afirandinên wî di "Bere-

vok"ekî de gihand hev û derxist.

Erebe Şemo di jiyana Siyasîya Komara Ermenîstanê de jî xwediyê ciyekî berbiçav bû. Ew çend caran hatiye helbijartin wekî "depûtatê" (gizîrê) sovyeta bajarê Erîvanê. Xebata wî ya jibo rejîma Sovyetîstanê hatiye ecibandin û wî bi nîşana "Ala Sor" û ya "Dostaniya Gelan" perû kirine.

Navê Erebe Şemo hê di jiyana wî de keti bû dîroka wêjeya kurdî ya hemdem û ewê neslên wêbêyê bi saya afirandinên wî yê ne mir wî bibîr bînin.

biranin

ŞIVANÊ KU BÛBÛ

NVÎSKAREKÎ ŞOREŞGER

Şevê germa teboxê bû. Kelekel û tîna rojê hê di hewayê da bû. Ji Şehneşîna Mêvanxana Armeniya Erîvan wekî qesreke perîya dixuya, roniyên wê bi hezaran di nav şeva havînê de diçirîsîn, stêrk û tavehîv dest dabûn wan û deştê Rewanê bi ronahiyeke şîrogerm, xewnî, dadigirtin. Li aliyekî Meydana Lenîna xelk, bi pîranî keç û xort, li qerexa avê rûniştibûn orkestra bajêr guhdarî dikirin, hinên din bi hev yariyan dikirin, dikenîn. Deng, reng, ronî û stran, ken û şahî bedewiyeke esrarenîz dida. Şeva Erîvanê.

Zengilê telefonê lê xist, min ji nişkeva wekî ku ji xewnekî şîrîn kişand. Gelo ewê kî bûna? Hê roja pêşîna hatina min a Erîvanê bû û min wê bi hevalê Radyoyê re derbas kiribû. Qewlê min û kesî tine bû. Min ra hişt hesincawê. Di seriyê têlê din de dengê germ û sivik dipeyîvî: "Êvara te baş, braziyê delal! Ez bolşevîkê kevn Erebe Şemo me. Tu ji wir heta vira bi ser çavên me re hatiyî. Gelo tu êkingê werî Apê xwe bîninî?" Erebe Şemo, nvîskarekî Şivanê Kurd, şoreşgerê navdar, merivekî nefspiçûk, mêvanhîz, û kurdperwer bû.

Du roj şûn de, tevî hevalekî din em çûn dîtina Erebe Şemo. Mala wî nêzîkî merkeza bajarê, di yek ji avahiyan nû yê pirta de bû. Malekî mitewazî û bêdebdebe. Zilamekî kînik, ne qels ne qelew, devliken û ligora emrê xwe liserxwe bû Erebe Şemo. Bi nezaket û qedirgiranî me derbasî menzela xwe ya xebatê kir. Jina wî, Ûrîs, pîrsa me kir û me bi tenê hişt.

Menzel bi pirtûkên kurdî, rûsî, ermenî dagirtîbû, liser masa xebatê hin kovar û pirtûkên "Akademiya Kurdî" diserdilê hevde li hêviya xwendinê ra diwestin. →

"Gelo halê Kurdê Ro mē çawa ye? Hê koçer hene? Hê Roma reş li Kurda pir tade dike? Hê hikmê beg, axa û şê xan liser gundiyan xurt e?" Piştî çend pirsên wilo derheqa Kurdistana Tirkîyê û xasme navçeya Qersê, Ereb Şemo dest bi bîr anîna salên pêşînên Şoreşa Sovyetî, yên şerê hindur û sazkirina sovyetan di gundên Kurdan de kir. Gava ku dipeyivî çavên wî ji kelûbînê diçirîsîn, hinek hêlesorî dikete rûyê wî, te digot qey xortaniya xwe hê ji nûvê dijî. Diyar bû ku ji vê dema jiyana xwe ji hemîyan bêtir hiz-

naskirina kirov û maksim gorkî

Gelo di vê jiyana dirêj û rengîn de kîjan qewîmandin pir wî dilxweş kiribû? Weşekî ponijî, çavên xwe nivgirt, weke ku li filma bûyerên rengînên sala temaşê bike. Dûre çendan jiwan ji nav yê di neqand: hinarikên wî hêlesorî bûn, bişîrî: "De ez nizanim kîjanî bêjim. Serfiraziya Ordî ya Sor û hikmê sovyetî ji hemîyan bêtir min kêfxweş kir. Ev xelasiya me feqir, fiqare û milletên piçûk bû. Serfiraziya şerê weteniyê dijî naziyên Hitler ji me hemîyan bêhesab şa kir. Dûre, hin şahiyên din hene, wekî roja ku şivanê Kurd bi rûst derket û linav hemî milletên Sovyetiyê belav bû. Îndî dengê ce maeta kurda ji ewê bihata sakirin. Ez bi naskirina Kîrov, Maksîm Gorkî jî pirr gellek şa bûm."

Di germahiya mijûlahiyê de me saetê ji

dikir "Salên şer pirr zehmetbûn, brazî. Kurmancên me bi gotina mela û musawatîstên azerbeycanî dixapiyan, nedixwastin ku Sovyet bikevin nava wan. Ji wan jî tirê ku ewê namûsa wan jî destê wan he re; ewê jinê, wan têxin berdilê mîrên din. Propaganda kontra-revolûsyonera ev bû; şêx û began wisa digot: xelkê cahil jî bawer dikir. Me pirr cefa kirî şand. Şikir ew roj îndî dî dîr in. Niha cemaet zariyên xwe çî kur çî qîz dide xwendin: halê me xweş bûye. Tîştê awa qet ji xwe nedihat xewna me jî".

bîr kiribû û ew ji leza xwe nedikete, digot qey ji hêrgav zûtir di geriya. Du saet û nivê me bûbû û me nedixwast "Apê Ereb"ê 79 salî bêtir biwestînin. Wî bixwe gotinê hanî rewşa niha. "Şikir îro halê cemaeta me tu jî dibîni xweş e: em hemî tîr û tijî ne. Kes li me tadê nake. Zariyên me jî wek yên milletên din dixweyin, ji me zana, doktor, profesor derdikevin. Erê di welatê sovyetiyê pîrmilletî de em milletekî piçûk in, lê bi îzn û ruxseta xwe em beramberî milletên din in; tîştêkî me ji wan ne kême. Xwezî rojekî ewa ji Kurdên Kurdîstanê re jî bihata; ew jî weke milletên din serfiraz û aza bijîna.

Em li ser rabûnê. Lê hate bîra min ku Ereb Şemo li ser dawiyên salên sîh, li ser salên çil û pêncî tiş-

tekî negotibû. Min zanibû ku ew di wan salan de hîvde salan di girtîgeh û kelê de mabû, wekî gellek kommunist û kesên din bêdadî û eziyet dibû, li sirgûnê jiyabû jî mirinê filitibû. Min jê pirr kir. Rûyê wî hinek germîçî, reng jê di kîşîya weka ku birînen wî jî nûva axivîbin.

"me dabû ser rêyekî nenas"

Qasekî fikirî û paşê gote min: Ez Komminîstêkî kevnim û bi komminîstiya xwe kubar im. Me dabû ser rêyekî nenas, rêya avakirina komminîzmê, ya azadiya kar keran û milletan. Di vê rêya nenas de xeletî û şaşî jî çêbûne, hinek jî me pê eşiyane.

Me rojên tarî û tengasî jî diye. Şikir evana hemî xelabûn û em gihîştine roja îro. "Wekî piraniva "komminîstên kevn" Ereb Şemo jî nedixwest liser van qewî mandinên salên "tarî û tengasî" yê bimîne, bipeyive. Ew karekî nav partiyê bû, di derva ne dihate gotin. Û wekî piraniya nîskarên sovyetî Ereb Şemo jî di romanên xwe de li ser demên dîrokiyên kevn, liser "tarî û tengasiyên" salên berî şoreşê an, yên şerên hindur dinivîsî.

Apê Ereb me heta ber derî verê kir. Bi dilgîranî silav li me kir. Berî ku dergeh li dû me bigre dîsa kir:

"Ji Kurdên Romê re silavê min bêje. Mêrê çêbin, çê bixebitin. Milletê xwe jî koletiyê xelas kin".

K E N D A L

Ferhengok

Azadî: (t) özgürlük; (f) liberté
 Belavok: bildiri; (f) communiqué, tracte
 Bestewin: (t) idil; (f) idylle
 Bêş: (t) vergi; (f) impôt, taxe
 Bêşdar: (t) yükümlü; (f) impôsable, taillable
 Bingeh: (t) ilke; (f) principe
 Biyanî: (t) yabancı; (f) étranger
 Bûyer: (t) olay; (f) évènement
 Civak: (t) toplum; (f) société
 Çand: (t) kültür; (f) culture
 Dereş: (t) sancak, (f) étendard
 Destpêkî: (t) başlangıç; (f) élémentaire
 Dijgiranî: (t) karşı ağırlık (f) contrè-poids
 Dirav: (t) para; (f) monnaie, argent
 Dîrok: (t) tarih; (f) histoire
 Frotîşk: (t) eşya; (f) marchandise
 Gelha: (t) nüfus; (f) population
 Girgîn: (t) somut; (f) concret
 Girîng: (t) önemli; (f) important
 Giştî: (t) genel; (f) général
 Hesincaw: (t) cihaz; (f) appareil

Heyam: (t) çağ; (f) age, époque
 Heyok: (t) nesne; (f) objet
 Hilberînî: (t) üretim; (f) production
 Hilberî: (t) ürün; (f) produit
 Hilmûgûlm: (t) buhar; (f) vapeur
 Hîm: (t) temel; (f) fondement
 Kevneperest: (t) tutucu; (f) conservateur
 Kêrha: (t) çıkar; (f) intérêt
 Komava: (t) komün; (f) commune
 Kovar: (t) dergi; (f) revue
 Mêtîngêhî: (t) sömürgeci; (f) colonial
 Navgîn: (t) araç; (f) moyen
 Paşverû: (t) gerici; (f) réactionnaire
 Peywendî: (t) ilişki; (f) relation, rapport
 Pêşverû: (t) ilerici; (f) progressiste
 Pêvajo: (t) süreç; (f) processus
 Rewş: (t) hal, durum; (f) état
 Sazgerîm: (t) mekanizma; (f) mécanisme
 Serwerî: (t) egemenlik; (f) souveraineté
 Suxre: (t) angarya; (f) corvée
 Şhrezayî: (t) uygarlık; (f) civilisation
 Teşe: (t) biçim; (f) forme
 Vegherîn: (t) dönüşüm; (f) transformation
 Vexwendin: (t) davet etmek (f) inviter

* Stran û Leylan * *

Ji ber kêmasiya cih, em di vê hejmarê de tenê navên kasetên Kurdî yên ku AZADÎ heta niha derxistiye didin. Her kasetekî 60 deqîqe dom dike, û bi 5 Dollar (10 DM) e. Hun dikarin sêlik û kasetên jêrîn jî me bixwazin.



azadî

► Bijarteyên Folklorê - 1
 Meqamên kevî bi Orkestra nûjen.

Lêdixê Orkestra Gelerî ya Kurdîstanê.

► Bijarteyên Folklorê - 2
 Kulamên Dilan - 1

► Bijarteyên Folklorê - 3
 Kulamên Dilan - 2

► Bijarteyên Folklorê - 4
 Kulamên Siyaran (Stranên-Şeran).

► Bijarteyên Folklorê - 5
 Blûr, Fîq (Dûdûk) û piyano

Fîq (dûdûk) : Egîtê Cimo
 Blûr : Şamilê Beko
 Piyano : Cemîla Celîl

◻ SELIK (Disque) ◻

Musique populaire du
 KURISTAN Cante d'Amour

Stran û leylandên
 KURDÎ


Kurdish Songs & Melodies

* Stran û Leylan * *

LÊ, LÊ, WASÊ

Allegretto

CEMÎLA CELÎL



Lê, lê, Wasê, lê, lê, lê, Wasînaê, wey, wey,¹⁾

Te p'orsorê, lê, lê, lê, h'ine dayê, wey, wey,

T'eşîrê, lê, lê, lê, çûre, wey, wey,

Mala Wasê, lê, lê, lê, mala wêda, wey, wey,

Wez radimûsim, lê, lê, lê, ji mala bavê, wey, wey.

Lenîn dibêje

ÇAWA MIROVAHÎ NIKARE BIGIHÊ WINDABÛNA SINIFAN(CÎNAN) BÊY GEHÎNEKA DERBASÎ YA DÎKTORIYA SINIFA BINDEST, WISA JÎ EW NIKARE BIGIHÊ TEVHEVÎYA NAYEREVÎNA(MIQEDERA) NETEWÛYAN TA KU EW DEMA DERBASOKA RIZGARIYA TEMAMÎ YA HEMÎ NETEWÛYÊN BINDEST NEJÎ, TA KU NETEWÛYÊN BINDEST AZADIYA XWE YA CIHÊ-BÛN Û VEQETANDINÊ BIDEST NEXIN,

Oeuvres (Afirandin), 22, p. 159



azadî

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ

Jibo nêzîkbûyîna hêz, bêşok û komikên şoresger û welatparêzên Kurdî tanê dixebite.

Bi arîkariya komekî Xebatkar û Xwendekarên Kurd derdikeve. Bi tu partî û hevdesaziyên tu perçeyekî Kurdîstanê ve negirêdayî ye.

Berpirsiyarê giştî : K E N D A L
Nivîsekarî : E V D O
Berpirsiyarê malhebûnê: H. KARACA
Foto-Maket : J. BERTOLINO
Çap : Îsmet-Mîsto-Raûf

NAVNÎŞAN (adres): K O V A R A A Z A D Î
B.P. 378 75625 PARIS CEDEX 13 France

● DIRAV (pere) li ser navnîşana A Z A D Î
CCP n° 23 37 449 L Paris/ France

KURDÎSTANA AZA, YEKBÛYÎ, SOSYALÎST!